



HDP

# BULTENA ÇANDINIYÊ

- Piştî ku hat ragihandin Konseya Şîr a Neteweyî 2 meh in tabloya maliyeta hilberandina şîrê xav naweşîne Konseyê tabloya maliyeta hilberandina şîrê xav ên meha hezîran û tîrmehê aşkera kir. Li gorî vê, di meha hezîranê de lîtreyek şîrê xav li ser hilberîneran bi 7.41 lîreyan bûye mal, di meha tîrmehê de jî bi 7.21 lîreyan bûye mal.
- Di sala 2019'an de kîloya pîvaz û kartolan li nuqtayên sererastkirina firotinê ku di meha sibatê de hatin avakirin daket heta 2 lîreyan. Lê îro ji sedî 400 zem bûne û kîloya pîvaz û kartolan derketiye 10 lîreyan.
- Piştî zemên ku hatine ser şîr û berhemên şîr, bihayê penirê spî, kaşar û rûnênivîşk ên ambelajkirî yê biçûk jî zêde bûn. Paketa penirê kaşar ku 4 cihên bi qasî 60 gramî giran têde hene bi 18,75 lîreyan tê firotin.
- Kooperatîfên Krediyê yê Çandiniyê, ragihand ku di sala 2022'yan de tona gulberojkan ji cotkarên ku peymana wan heye bi 10.750 lîreyan bikire, ji cotkarên ku peymana wan tune ye jî bi 10.450 lîreyan bikire.
- Ji ber pestûsît yanî bermayiya jehra çandiniyê di sala 2021'an de li welatên Yekitiya Ewropayê (YE) 372 îxbarname ji ber Tirkiyeyê hatin kirin. Li gorî 3 salên beriya niha van îxbarnameyan 3 qat zêde bûne û reqor hatiye şikandin. Di nivê destpêka sala 2022'yan de ev îxbarname derketine 259'an.
- ÎGSAŞ'ê; gubreyên Ure, DAP û kompoze zem kirin. Bi zeman re bihayê tona gubreya Ure jî 12 hezar û 600 lîreyan derket 13 hezar lîreyan, gubreya DAP jî 17 hezar û 650 lîreyan derketiye 18 hezar û 200 lîreyan û gubreya 20.20.0 jî 11 hezar û 250 lîreyan derketiye 12 hezar û 50 lîreyan. Di nav firmayên Amonyum Sulfatê de jî firotina tona gubreyê di navbera 6 hezar û 200 û 7 hezar lîreyî de diguhere. Bihayê gubreya Can jî di navbera 6 hezar û 800 û 7 hezar û 200 lîreyî de ye.
- Di demên dawîn de gelek nûçeyên ku gubreyan sexte tê firotin hatin weşandin. Hat ragihandin ku li Nîgde, Konya, Mêrsîn û Edenê 17 cotkar mexdûr bûne.
- Yekitiya Hilberînerên Mişên Hingiv, ragihand ku bihayê hingivê kulîlkan ê bipatenta nîşana erdnîgariyê weke 200 û 230 lîreyî diyar kirine.
- Kooperatîfên Krediyê yê Çandiniyê, ragihand ku di sala 2022'yan de tona gulberojkan ji cotkarên ku peymana wan heye bi 10.750 lîreyan bikire, ji cotkarên ku peymana wan tune ye jî bi 10.450 lîreyan bikire. Kooperatîfa Firotinê ya Çandiniyê Çûkobîrlîk jî bihayê kirîna serê kîloyê weke 11 lîre û 25 qurîş aşkera kir.
- Borsaya Bazirganiyê ya Nazîlliye, kîloya hêjîrên hişk ên destpêka werzê ku 6 hilberîneran anîbû bi 400 lîreyî firot.
- Konya Şeker, bihayê kirîna gulberojkên birûn ên sala 2022'yan aşkera kir. Li gorî vê, bihayê tona gulberojkên ji sedî 40 birûn weke 12 hezar lîre, ji sedî 44 birûn weke 12 hezar û 700 lîre, ji sedî 50 birûn weke 13 hezar û 750 lîre hat diyarkirin.

- Ofîsa Berhemên Axê (TMO), bihayê tona garis a sala 2022'yan weke 5 hezar û 70 lîre û tona mewijê weke 27 lîre aşkera kir. Lê hilberînerên mewijê li bendê bûn ku bihayê tona mewijê herî kêr biba 35 an jî 36 lîre.
- Ofîsa Berhemên Axê (TMO) ku tona nîskên biqalik weke 14 hezar lîre aşkera kiribû derxist 15 hezar lîreyan.
- Saziya Statîskên Tirkiyeyê (TUİK), daneyên “Endeksa Bihayê Hilberîneran a Berhemên Çandiniyê, Tîrmeh 2022” weşand. Li gorî vê endeksa bihayê hilberînerên berhemên çandiniyê (Tarîm-ÛFE) salê ji sedî 157.89 û mehê ji sedî 5.00 zêde bûye û di enflasyona hilberandina çandiniyê de reqor hatiye şikandin.
- Hat ragihandin ku hilberînerên Oreo, Mikado û Pepitoyê, li ser îhtîmala bakteriya salmonella ya di berhemên Mondelezê yê navenda wan Amerîka 3 qadên xwe yê hilberandinê girtine.
- Serokê Yekitiya Navenda Hilberînerên Mêşan a Tirkiyeyê Ziya Şahîn, diyar kir ku sala borî hilberandina kîloyek hingivê kulîlkan li ser hilberîneran bi 25 û 26 lîreyî bûye mal û wan jî kîloya hingivê weke tevdeyî bi 30 lîreyî firotiye.
- Serokê Sera-Bîr'ê Muslum Yanmaz, diyar kir ku ji ber maliyeta zêde û zêdebûna daxwaza kirîna derveyî welat a li Ewropayê ku krîza enerjîyê dijî û dê hilberandin lê kêr biba û zivistanê wê kîloya firîngîyan derkeve 50 lîreyan.
- Li gorî daneyên ÎTO'yê, li Stenbolê di meha tebaxê de Îndeksa Debara Mûçekarên Stenbolê ku nîşaneyê tevgerên bihayê perakende ye mehê ji sedî 2,29 û bihayên tevdeyî jî ji sedî 6,90 zêde bûye.
- Konfederasyona Sendîkayên Karkeran a Tirkiyeyê (Türk-İş), aşkera kir ku li Enqerê xerckirina xurek a malbateke ku ji 4 kesan pêk tê di meha tebaxê de li gorî mehek berê ji sedî 0,73 zêde bûye; sînorê birçîbûnê jî bi 6.890 lîreyî bi qasî hezar û 390 lîreyî di ser heqdesta asgarî de pêk hatiye.
- Di nav berhemên ku bêyî baceya gumrikê dikarin bînin hinartin û di Rojnameya Fermî de hatine weşandin de, masiyên baskê Nîl, Koka Pasîfîkê, kêzika Alaskayê û her wiha xwarinên behrê yê Ewropayê, masiyên kalamar û cureyên wan ên cemidî hene.
- Gundên girêdayî Pirsûsa navçeya Rihayê yê wekî Kuçukkopru, Eskice, Kuçuksergen, Buyuksergen, Ekili û Pinarbaşı ji ber projeya avadaniya bi rêya pompayan ya li deşta Pirsûsê ku di sala 2014'an de dest pê kiribû, beriya ku proje biqede ew gundên deştê veguherîn çolan.
- Wezîrê parastinê ragihand ku 3 keştî ji keştîyên bi genim û madeyên xwarinê barkirî yê li benderên Ukraynayê li bendê ne ku dest bi tevgerê bikin.
- Li gorî daneyên Meclisa Hinardekarên Tirkiyeyê (TIM) hinartina Tirkiyeyê di 7 mehên îsal da li gor heman heyama sala 2021'ê ji sedî 19,1 zêde bûye û derketiye 144 milyar û 416 milyon dolarî. Di meha çile û tîrmehê de herî zêde hinartina koma çandiniyê bi 18 milyar û 790 milyon dolarî pêk hat.
- Lijneya Sektora Fêkî û Zebzeyên Teze ya TÎM'ê diyar kir ku di ketina Bulgaristanê de di warê hinartinan de zehmetiyên mezin hene. Hat diyarkirin ku li deriyê sînor metirsiya ku bi qasî 100 milyon dolar berhem bînin avêtin heye.
- Komeleyên Hinardekarên Behra Egeyê (EIB) daxuyand ku ji 31'ê tîrmehê heta niha hinartina 3 qat tirî, behîvên hişk û hêjîrên hişk ku di sezona 2020/21'an de 914 milyon dolar bû, Di heman heyama sala 2021-2022'an de ji sedî 11 zêde bû û bû 1 milyar 15 milyon dolar.

- Hikumeta Hindistanê, ji bo pêşgirtina zêdebûna bihayên tiştên tên firotin, biryara sînordarkirina firotina derveyî welat a arvanê genim da.
- Komîsyona Yekitiya Ewropayê (YE), ji bo hilberandina garis a îsal cara duyemîn texmîna xwe daxist. Komîsyonê, ji bo werza 2022-2023'yan hêviya xwe ya hilberandina garis mehek berê weke 65,8 milyon ton aşkera kiribû. Komîsyonê, vê hêviya xwe ji 10 kêr kir û daxist 59,3 milyon tonî. Wê ev bibe hilberandina herî kêr a 7 salên dawîn.

## Berhemên Demsalî

